Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar :1061 3-Gulan- 2023 www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ nameronahi@gmail.com 423165

# Koperatîfên çandiniyê bi jinan geş dibin

**Aboriya Jinê ya li Bakur-Rojhilatê Sûriyeyê zeviyê ji 45 hezar donimî diçîne û kar ji hezar jinan re peyda dike.**



Komîteya Aboriyê ya Rêveberiya Xweser a Bakur-Rojhilatê Sûriyeyê û Aboriya Jinê ya Kongra Star hem derfetên kar ji jinan re peyda dikin, hem jî çandiniyê xurt dikin. Li Bakur-Rojhilatê Sûriyeyê koperatîfên ji sê salan hene. Aboriya Jinê îsal jî dest bi gelek projeyên nû kir. Li Dêrikê li gundên Zihêriyê, Eyn Dîwar û Teqil Beqilê sê koperatîf hene û 60 jin di nav de dixebitin. Li bajarê Girkê Legê nêzî 39 jin di nava koperatîfê de kar dikin. Li koperatîfa li Amûdê jî du malbat dixebitin. Ji gundê Elî Bedran ê Tirbespiyê 18 jin, li gundê Digirê jî çar malbat cihê xwe di nava koperatîfê de digrin. Li Şedadê 160 jin di nava koperatîfê de dixebitin. Li Til Temir û Dirbêsiyê jî koperatîf hene. ji ber ku gundên li Kobanê nêzî sînor e ji ber ewlekariyê koperatîf nehatibûn avakirin, lê di sala 2023'an de yekem car hatin avakirin. Li Kobanê niha koperatîfek bi 5 endamên xwe yên jin hene. Li Şehbayê di nava çar koperatîfan de 19 malbat dixebitin. Ji sedî 75 ê dahatiwa ji koperatîfan ji wan jinan re tê dayin ku di nava koperatîfan de kar dikin. Ji sedî 10 ji dahatiwa ji sindoqên koperatîfan û ji sedî 15 jî ji bo hilberandina projeyên nû dikeve qaseya Aboriya Jinê.

**Amadekarıyên jı bo projeyên nû**

Li Bakur-Rojhilatê Sûriyeyê li gel çandiniya genim, kemûn, nok, nîsk û nehne îsal çandiniya darên fêkî jî destpê kir û proje hîn jî dewam dike. Li Herêma Cizîrê ev proje ji aliyê Aboriya Jinê ve tê meşandin. Di 1'ê Adarê de li Dêrikê 4 hezar darên xurme, hijîr, mêw û zeytûn hatin çandin. Di nava du salan de wê fêkî jê werin berhevkirin. Her 10 dar wê radestî malbatekê bêne kirin û mîna koperatîfê bê bikaranîn. Li Herêma Firatê jî 4 hezar û 500 mêw hatin çandin; ji bo koperatîfa konserve têne amadekirin.

Aboriya Jinê ku amadekariyê ji hilberandina zibil ê xwezayî dike, hem ji bo aborî gemarî nebe hem jî çanda paqijiyê belav bibe wê ji qalikên hêk û fêkiyan dest bi hilberandina gubre yê xwezayî bike.

**Zeviyê çandiniyê yê ji 45 hezar donimî**

Ji rêveberên Aboriya Jinê ya Bakur-Rojhilatê Sûriyeyê Gulê Mûrad da xuyakirin ku, "Yek ji armancên damezrandina Komîteya Aboriyê avakirina koperatîfan bû. Armanca me ya destpêkê ji nûve geşkirina ruhê komûnalbûnê ye. Me xwest ku gel bi hev re civakbûnê û hestê alîkariyê xurt bike."

Gulê Mûrad ragihand ku Aboriya Jinê xwedî zeviyekî ji 45 hezar donimî ye, beşeke mezin a zeviyên wê jî li gundan e û got, "Zeviyên me li bajêr gelekî kêm in. Ji bo li zeviyan binihêrin malbat û jinên li nêzî zeviyan têne hilbijartin. Ji ber ku yên tevlî koperatîfê dibin divê karibin zeviyan baş bi kar bînin. Divê ji çandiniyê fêhm bikin, li zeviyan xwedî derkevin. Lewma dema li gundekî zeviyekî me hebe em ji wî gundî malbatên nêzî zevî hildibijêrin. Ji bo koperatîfan pêwîstî bi pisporiyê nîne. Xelkê me yê li gundan ji xwe ji çandiniyê fêhm dikin. Tecrûbeyên wan gelekî zêde ye. Bi demê re tecrûbeyên xwe zêde dikin. Ya esasî ew e ku xwedî li xakê derkevin, zeviyan xwedî bikin."

**Bandora şer û dorpêçê li ser çandiniya genim**

Gulê Mûrad diyar kir ku xaka Bakur-Rojhilatê Sûriyeyê dewlemend e û got, "Xaka me ji bo çandiniyê guncaw e. Her dara ku tê çand berhem jê tê. Di mijara av û hewayê de jî herêma Cizîrê bêhtir guncaw e, lê belê em ji herêmên me yên din jî berheman bi dest dixin. Em giraniyê didin ser çandiniya genim. Li herêmê timî atmosfereke şer heye. Li gel şer her wiha ambargo jî dewam dike. Lewma pirsgirêka nan û ard heye. Ji ber vê jî em neçar dimînin ku giraniyê bidin ser genim. Tevî genim her wiha nîsk, nok, kemûn, ceh, garis, şênkahî, darên fêkî jî têne çandin. Bi taybetî li zeviyên di destê Aboriya Jinê de ne bîrên avê tune bûn. Li benda baranê diman. Rewşeke bi şensê ve girêdayî hebû. Em hîn negihîştine wê astê ku pêwîstiyên Bakur-Rojhilatê Sûriyeyê fînanse bikin. Em gihîştin heta astekê lê belê hîn bi temamî nikarin fînanse bikin. Şênkahiya ku me çandiye bi buhayekî kêm difiroşin. Gelê me ji vê razî ye. Genim jî li embaran têne bi cihkirin."

**Bîrên avê û enerjıya rojê**

Gulê Mûrad diyar kir, ku îsal bi giranî li derdora zeviyan dest bi kolandina bîran kirine û wê hejmara bîran zêde bikin û got, "Av çiqasî zêde be çandinî jî wê ewqasî bi pêş bikeve. Pêwîstiya me bi amûrên teknîkî heye, lê belê bi demê re wê çareser bibe. Her wiha me dest bi amadekariya sîstema enerjiya rojê jî kirî ye, ji ber ku li herêmê pirsgirêka elektrîk û mazotê heye. Bi vî rengî em ê van pirsgirêkan bi sîstema enerjiya rojê çareser bikin. Temamiya van projeyan jî wê pêşkêşî xizmeta koperatîfan bêne kirin."

## Di kevirekî asîmanî de hêmanên pêwîst ên jiyanê hatin dîtin

**Amîno asîdên ku hêmanên bingehîn ên jiyana li cîhanê ne di parçeyek ji kevirekî asîmanî hatin girtin de hatin dîtin.**

Encamên lêkolînên di derbarê nimûneyên ku ji kevirekî asîmanî yê ji aliyê sondaya fezayê ya Japonî ve hat girtin de, hatin ragihandin.



Encamên lêkolîna ji aliyê Zanîngeha Okayamayê ve tê birêvebirin di kovareke zanistî ya Japonî de hatin weşandin.

Bi lêkolînê îşaret bi şaneyên têkildarê koka jiyana li cîhanê yên ji van amîno asîd û hêmanên organîk ên ji asteroîdê bi navê Ryûgû tê dike.

Li gorî lêkolînê "Keşifkirina amîno asîdên proteîn jê çêdibin girîng e, lewre Ryûgû, berovajiyê meteroîdan rastî biyosfera cîhanê nehatiye."

Li gorî lêkolîneran ji ber vê sedemê, "ji bo îspatkirina wan, herî kêm beşek ji van hêmanên bingehîn ên jiyanê li ser erdê dibe ku li hawîrdorên fezayê çêbibin."

Lekolîneran di nimûneyeke 5,4 gramî ya kevir û toza reş de 23 cureyên cuda yên amîno asîdan tespît kirin ku ji aliyê sondeya Hayabûsa-2 ya Japonî ve hatiye girtin. Sondeya fezayê di dawiya sala 2020'an de, piştî mîsyonek şeş salî vegeriya.

Asteroîda Ryûgû di sala 1999'an de hat dîtin. Ew herî kêm 300 mîlyon kîlometre dûrî cîhanê ye û mezinahiya wê 900 metre ye.

Zanyar difikirin ku hin ji materyalên asteroîd bi qasî pênc mîlyon sal piştî zayîna pergala me ya rojê çêbûne û ji 100 dereceyî zêdetir germ nebûne.

Sudoku: Bersiv 70

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 7 | 4 | 2 | 3 | 9 | 6 | 1 | 8 | 5 |
| 3 | 1 | 6 | 8 | 7 | 5 | 9 | 4 | 2 |
| 5 | 9 | 8 | 4 | 1 | 2 | 3 | 7 | 6 |
| 1 | 8 | 7 | 2 | 3 | 9 | 6 | 5 | 4 |
| 4 | 5 | 3 | 7 | 6 | 1 | 2 | 9 | 8 |
| 2 | 6 | 9 | 5 | 4 | 8 | 7 | 3 | 1 |
| 9 | 2 | 5 | 6 | 8 | 3 | 4 | 1 | 7 |
| 6 | 7 | 1 | 9 | 5 | 4 | 8 | 2 | 3 |
| 8 | 3 | 4 | 1 | 2 | 7 | 5 | 6 | 9 |

Sudoku:Pirs 71

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 4 | | 8 | | | 3 | | | |
| 2 | | 1 | 7 | | 9 | | | 8 |
| | | 9 | | | | | 1 | |
| | | | | 8 | | 3 | 5 | |
| 8 | | | 1 | | 4 | | | 6 |
| | 5 | 4 | | 7 | | | | |
| | 9 | | | | | 6 | | |
| 3 | | | 4 | | 1 | 9 | | 7 |
| | | | 2 | | | 8 | | 5 |

## Quncika Têgînan

| | |
|---|---|
| Ajel | Lawir, candar, heywan. |
| Bûro (Fransî) | Nivîsgeh, odeya xebatê, ofîs. |
| Bûrokrasî (Fransî) | 1.Koma rêveberên dewletê yên asta wan li jorê.<br>2.Meşandina karê rêveberiyê: Ji ber bûrokrasiya giran plana me nemeşiya. |
| Fermanber | Kesê di karê dewletê de bi mûçeyê dixebite, memur, mûwezef. |
| Fon (Fransî) | Diravên ji bo bikaranîna karekî diyar hatîn cudakirin, çavkanî: Ji bo piştgiriya mamosteyan fon hat veqetandin. |
| Kargeh | Ciyê ku kar lê tê kirin. Paloke, fabrîqe, memele. |
| Karmend | Xwediyê kar, karbidest. |
| Moçik | Tasa ji dar hatî çêkirin. |
| Mûçe | Mehaneya ji bo kesên kar dikin tê dayîn. Meaş. |
| Nakokî | Tiştên dijberî hev: Di navbera wan de nakokî derket. |

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar :1061 3-Gulan- 2023 www.ronahi.net/ku/



## "Bi saya fikrê Rêber Apo jina Kurd bû pêşenga civak û jinên azadîxwaz"

Jinên kantona Qamişlo di roja 1'ê Gulanê de diyar kirin ku bi saya fikr û felsefeya Rêber Apo jinên kurd di tevahiya qadên jiyanê de bûn pêşengê civak û jinên azadîxwaz.R-2

## "Bi bilindkirina asta têkoşînê wê tecrîda girankirî têk biçe"



Nivîskar û siyasetmedarên herêma Cizîrê diyar kirin ku tecrîda girankirî ya li ser Rêber Apo li ser tevahiya mirovahiyê û gotin:"Ji bo têkbirîna tecrîda girankirî ya li ser Rêber Apo divê asta têkoşîna gelê Kurd bilintir bibe" R-4

# KES NIKARE DENGÊ RASTIYÊ BÊ DENG BIKE

Rojnamevanên li bakur û rojhilatê Sûriyê diyar kirin ku dewleta Tirk li Bakurê Kurdistanê û Tirkiyê ji bo veşartina berxwedana gel û binpêkirinên xwe, rojnamevanên çapemeniya Azad binçav dike û gotin: "Hikumeta AKP-MHP'ê ji bo ku civakê bêdeng bike û di hilbijartina de bi ser keve, êrîşên xw yên li dijî rojnamevanan zêde dike.R-5







## "Wê berxwena gelê herêma Şehbayê dorpêçê bişkîn e"

Seroka Desteya Jinê ya Kantona Cizîrê Evîn Paşp diyar kir ku Hikûmeta Şamê bi siyaseta dorpêçê ya ku li ser gelê Şehbayê dide meşandin dixwaze vîna gel têk bibe û got, zihniyeta Hikûmeta Şamê nehatiye guhertin, hevgirtin û berxwedana gelê Şehbayê wê dorpêç têk bibe.R-4

## Bîlançoya şer a meha Nîsanê




HPG'ê da zanîn ku artêşa Tirk a dagirker di Nîsanê de hezar û 81 caran bombe li Herêmên Parastinê yên Medyayê barandin û 8 caran bi çekên kîmyewî êriş bir ser çeperên berxwedanê yên gerîla.R-3

## Şêxmûs Ehmed: Astengiya herî mezin dorpêç û êrîşên dagirkeriyê ne



Hevserokê Nivîsgeha Kar û Barên Koçberan a Rêveberiya Xweser Şêxmûs Ehmed diyar kir ku rewşa kampên herêma Cizîrê û Şehbayê xerabin û got, astengiya herî mezin li pêş me, dorpêç û êrîşên dagirkeriyê ne.R-6

## "Li hemberî qirkirina xwezayê em têkoşînê dikin"



Karkerên Jin yên meştilgiha Şehîd Barîn a Giştî ya li bajarê Qamişlo, diyar kirin ku ew bi karê xwe yê di meştelgehê de hewl didin ku li dijî qirkirina xwezayê bisekinin û xwezaya herêmê ji nû ve zindî bikin.R-6

Zekî BEDRAN
Erdogan hîn jî çavkaniya xirabiyê ye R-5



Farûk SAKIK
Piştî Erdgan!!! R-5

# “Bi saya fikrê Rêber Apo jina Kurd bû pêşenga civak û jinên azadîxwaz”

Jinên kantona Qamişlo di roja 1’ê Gulanê de diyar kirin ku bi saya fikr û felsefeya Rêber Apo jinên kurd di tevahiya qadên jiyanê de bûn pêşengê civak û jinên azadîxwaz.

**Reşo Qamişlo /Qamişlo**

1’ê Gulanê wek Cejna Karkeran, Cejna Karker û Kedkaran, Roja Ked û Piştgiriyê û hwd tê bilêvkirin û li gelek welatên cîhanê betlaneya fermî ye. Bê guman wekî her rojeke navneteweyî û dîrokî, ev roj xwedî wateyeke mezin û ji sala 1890`î ve li welatên cîhanê bigiştî wekî rojeke tayebet û watedar tê dîtin. Bi taybet ev roj li cem jinan xwedî taybetmendiyeke mezin e. Jin û keda jinê bi avabûna dewlet û desthilatdarî ve, ango ev nêzî 6 hezar sal in di bin zilmekî mezin de ye. Lê bi fikrê Rêber Apo, Tevgerê Azadiya Kurdistanê jin kiriyê navendê hemû hewldanên xwe yên wekhevî û azadiyê. Wekê Rêber Apo diyar kiriye, heta jin azad nebe civak azad nabe. Şoreşa Rojava Jî ji bo azadiya gel û hemû neheqiyên ji destpêke dîrokê heta niha hatinê kirin vegerê mafê xwe, têdikoşe.

Gelên Rojava û Bakur û Rojhilatê Sûriyê, gelên li cografyaya Kurdistanê dijîn bi hezaran sal e li benda vî fikrê rast bûn. Ji ber ku ev fikir ji nava jiyana wan, ji nava çanda wan derket û bû sîstemeke rêveberiyê û jiyanê.Li vir ked digihêje maneya xwe ya rastîn. Li vir her kes û her tişt di asta pîrozî de tê dest girtin.

Li vir maf li gorî mibdeya hebûn tê peşvazî kirin. Li vir cudatî li ser esasî xurtkirinê hev dixebite. Li vir şer tenê ji bo xwe parastinê tê kirin. Li vir zanist ji bo pêşxistina jiyana azad û bi rûmet tê bilindkirin. Lewma hêvî û baweriya hemû gel, civak, tebeqa û beşên mirovan xurt dike. Lewma ji çar



aliyê cihanê keç û xortan xwe bi vir ve digrin. Lewma Şoreşa Rojava dibê mînaka jiyana azad a hemû kedkaran.

Derbarê 1’ê Gulanê Roja Karkerên Cîhanê û ked û xebata jinên bakur û Rojhilatê Sûriyê, jinên rîveber yên kantona Qamişlo ji me re axivîn.

**‘’Bi saya Rêber Apo jin bû pêşenga civakê’**

Rêvebera Şaredariya Til Meirûf Xaliya Ehmed , diyar kir ku jinê bi saya fikr û felsefeya Rêber Apo, destkeftiyên girîng bi dest xistin û wiha got:”Beriya Şoreşa Rojava, rewşa jinê netenê li bakur û rojhilatê Sûriyê, di aloziyekê de bû, lê li tevaya Rojhilata Navîn normalde wisa jin bê taqet bûn û gavên pêşketina wê di destê desthilatdaran de bû.Herwiha ev yek heya berî damezrandina PPK`ê ya ku bi saya fikr û felsefeya Rêbertî



ava bû, wisa berdewam kir. Hêjayî gotinê ye ku gelek jinên azdîxwaz û xebatkar yên her çar parçeyên Kurdistanê tevlî vê tevgerê bûn û ji aliyê idiyolojî ve gelek pêş ket.”

Xaliya Ehmed da xuyakirin ku bi fikr û felsefeya Rêber Apo agirê Şoreşa 19`ê Tîrmehê hat dadan û ev şoreş jî bû derfetek ji jinên Rojava û bakur û rojhilatê Sûriyê re, da ku xwe pêşbixin û mafê xwe bi dest bixin û wiha domand: “Kar û xebatên ku jinên me di dema niha de dikin, rola jinê ya pêşengiyê tekez dike. Cihê rûmetdariyê ye ku jinên hemû pêkhateyên di herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê de xwe di hemû waran de pêş xistiye û tevlî xebata siyasî, aborî, leşkerî û hwd… bûne. Herwiha ji bo bidestxistina mafên xwe xebatê dikin. Em weke jinê xwedî fikrên azad yên bakur û rojhilatê Sûriyê



Cejina Kedkar û Karkeran li Rêber Apo û hemû kedkarên jin pîroz dikin.”

**‘Felsefeya Rêber Apo ronahî da fikra jinên azdîxawz’**

Hevseroka Şaredariya bajarê Qamişlo Emel Şemdîn jî da zanîn ku felsefeya Rêber Apo jinên bakur û rojhilatê Sûriyê di hemû waran de bi pêş ve bir û wiha domand:” Rast e jinên bakur û rojhilatê Sûriyê bi saya fikrên Rêber Apo yên azad, di hemû qadên jiyanê de gavên binirx avêtin pêş, heya astekê li gor derfetên heyî ev destkeftî baş bûn, lê dîsa jî divê birengekî pêşketî ya li gor serdema ku em tê de dijîn, xebat û têkoşînê bikin. Herwiha ji ber ku êrîşên qirêj ji aliyê hêzên desthilatdar ve, bi ser jinê de tên û hertim dixwazin wê bixin bin ferweriya xwe de û nehe ku pêş bikeve.”

# Çareseriya cinsiyetparêziyê çi ye?

**Nehîr Pale**

**Di têkiliya jin û mêr de gelek kêm û kurtî hene, ev kêm û kurtî bi kesan re sînordar nemaye û giştî bûye. Para cinsiyetparêziyê di vê yekê de çi ye? Em ê çawa li hemberî cinsiyetparêziyê têbikoşin û bi kîjan rê û rêbazî xwe ji cinsiyetparêziyê rizgar bikin?**

Kok û rehên cinsiyetparêziyê gelekî kûr in, ji şikandina yekemîn a jin re ku 4000 BZ ji Sûmeran destpêkiribû û heyanî roja îro berdewam dike. Ji xwe vê cinsiyetparêziyê ne tenê jin her wiha civak jî tarûmar kiriye û jin ji aliyê ruhî û fikrî ve parçe-parçe kiriye ku gihîştiye asta êdî xwe nasnake û nizane ew kî ye? Dema ku tu ji jinekê bipirsê tu kî ye? Bê ku bifikire wê hema bi yek carê bibêje navê wê çi ye û ew keça kî ye, yan jî hevjîna kî ye û ji kuderê ye? Nasnameya xwe girêdayî bav û hevjînê xwe tîne ziman. Pirsgirêkên di encama cinsiyetparêziyê de derdikevin ne tenê exlaqî ne. Mînak piştî ku jin 14`ê Îlonê sala 2022`an li Rojhilatê Kurdistanê û Îranê serî li hemberî sîstemê rakir û guhertina sîstemê xwest, dewleta Îranê heyanî rêbazê li dibistanan jehrîkirina şagirtên jin bi kar anî. Li dibistanên 25 bajarên Rojhilatê Kurdistanê û Îranê zêdetirî 1000 şagirtên jin hatin jehrî kirin. Li gorî nûçeyên ajansan heyanî roja 25`ê Nîsanê li dibistanên Kirmaşan û Tehran ên Îranê dîsa şagirtên jin hatine jehrî kirin. Her wiha piştî ku Talîban 15`ê Tebaxê 2021`an Afxanistan dagirkirin, çuyîna jinan a dibistan û zanîngehan qedexe kirin û dibistanên tenê şagirtên jin lê dixwînin, girtin, hemû jinên ku li saziyan dixebitîn ew ji kar sekinandin û mafê wan ê li saziyên dîtir bixebitin ji wan sitandin, piştre qedexe kirin ku jin biçin cihên vehesînê. Her wiha avahiya Wezareta Kar û Barê Jin girtin û avahî radestî wezareteke din kirin.

Li bajarê Helebê yê Sûriyê jî roja 26`ê Nîsanê 2023`an kuştina mêrekî ya du keçan ku temenê wan (13,14) salî ye ket rojeva medyayê. Ev mêr ne yekî ji wan keçikan dûre, bavê wan e û ew jî keçên wî ne. Mêr bê ku hesabê ol û civakê bike destdirêjî keçên xwe dike û wan qetil dike.

Çavkaniya van buyeran çi ye? Misoger; cinsiyetparêzî ye. Rêber Abdullah Ocalan di parêznameya 3`emîn de (Ceribandinek Li Ser Sosyolojiya Azadiyê) cinsiyetparêziyê weke pirsgirêkeke civakî pênase dike û çareseriya wê jî tîne ziman.

Hinek têgeh û gotinên pêşiyan mîna: `Divê tu ço ji ser serê wê, daşik ji zik wê kêm nekî, Lêbixin bi tîran aş bikin bi qîran, Eger tu qîza xwe serbest berdî yan wê bigihe daholvan an jî zirnevan, Serê keçan bernedin, Divê mirov wê zû bi mêrekî ve girê bide, Jina mîna mêran, Kurikê mîna keçan` îfadeya cinsiyetparêziyê dikin. Gelek gotin û têgehên me, rê û rêbazên me cinsiyetparêziyê xurt dike û nahêle hilweşê. Ji ber vê yekê dema ku zext, lêdan, kuştin, destdirêjî, zewaca bi temenê biçûk ango hemû rê û rêbazên tundwarî li beramberî jinê tên bikar anîn, sedema wê zîhniyet e. Keç temenê wê dibe 4`salî êdî malbat dest pê dike di bin navê exlaq, şeref û namûsê de qanûnan jê re datînin; wê çawa bimeşe, çawa birûne, çawa bixwe, çawa bikene, biçe kuderê, bi kî re baxive, çi li xwe bike û hwd diyar dike. Ji xwe dema ku temenê wê derbasî 11,12 salî dibe êdî wê ji zewacê re amade dikin, temenê wê bibe 20 salî û hîna nezewicî ye dibêjin di malê de maye, ev nêzîkatî hemû cinsiyetparêziyê îfade dikin. Li Sûriyeyê, Îranê, Afxanistan û tevahî cîhanê êrîş û tundiya li ser jinê dibe ku em li beramberî wê şoq nemîn in. Ji ber zîhniyeta me dibe sedema qewmandina van buyeran.

Cinsiyetparêzî mîna Rêber Abdullah Ocalan dibêje pirsgirêkeke civakî ye û çareseriya wê JINEOLOJî datîne. Ango jin çiqasî xwe weke jin inkar bike, teqlîda mêr bike, gezinc bike, bigrî, intîhar bike yan koçberî derve bibe ew ê dîsa nikarbe xwe ji cinsiyetparêziyê rizgar bike yan jî li hemberî wê têbikoş e.

Bi riya tehlîlkirina cinsiyetparêziyê, perwerde, têkoşîn, rêxistinkirin, xwebûn û Jineolojî mirov dikare xwe ji cinsiyetparêziyê rizgar bike û çareseriyê jê re deyne.

Dirûşmeya Jin, Jiyan, Azadî yek ji rêbazên li xwe veger û rizgarkirina ji cinsiyetparêziyê ye.



# Bi perspektîfa Kurdistanî Lozan


Pêşangeha bi navê “2+2=KRDSTN” îşaret bi gotinên Qazî Mihemed dike. Pêşangeh li bajarê Lozana yê Swîsreyê hat vekirin. Pêşangeh bala xelkê dîasporayê dibe ser Peymana Lozanê û texrîbatên wê. Pêşangeh hewl dide bi perspektîfeke Kurd û Kurdistanî ji nû ve, bi belgeyên dîrokî û berhemên hunerî bîra civakî zindî bike.

**Navenda nûçeyan**

Pêşangeha “2+2=KRDSTN” 28’ê Nîsanê (doh) li bajarê Swîsreyê Lozanê ji serdana xelkê re vebû. Peymana Lozanê qederê beriya bi 100 salan, li bajarê Lozanê hatibû îmzekirin û pê rê li ber sirgûn û qirkirina Kurdan û gelên din ên herêmê vebûbû. Peymana Lozanê di 24´ê Tîrmeha 1923’yan de ji aliyê nûnerên Tirkiye, Brîtanya, Fransa, Îtalya, Japoniya, Yewnanîstan, Romanya û Yugoslavyayê ve li avahiya Palais Du Rumine a Lozanê hatibû îmzekirin. Yanî 24´ê Tîrmeha bê ev peyman sed salên xwe temam dike.

Ji ber ku Peymana Lozanê hat îmzekirin û kete meriyetê, Peymana Sêvrê ya ku mafê diyarkirina çarenûsê ya Kurdan qebûl dikir, êdî betal bû. Piştî vê bûyerê erdnîgariya ku Kurd bi hezarê salan bi Asûrî, Ermenî û gelên din ên kevnar re lê diman, bi sînorên netewe dewletên çêkirî, parçe parçe bû. Rêyên jiyana xwezayî, rê, çiya, çem û têkiliyên xizmên wan êdî kete bin serweriya netewe dewletên serdest de û gelên li heremê bi feraseta “yek ziman, yek netewe, yek al” rastî komkujî û sirgûnên bêhêjmar hatin.

Çalakiyên sala 100’emîn ên ku par ji aliyê Komîteya Bibîranîna Sala 100’emîn a Lozanê (Lozan 2023) ve meha Mijdarê dest pê kirin, bi konferans, panel, çalakiyên hunerî çandî



berdewam in. Di çarçoveya çalakiyên sala 100’emîn de, bi tevlîbûna hunermendên ji 4 aliyên Kurdistanê, Elmanya û Îtalyayê, pêşangeha bi navê “2+2=KRDSTN” li bajarê Swîsreyê Lozanê hat vekirin.

**Rastiya Kurdistan û derûdora wê**

Di vê pêşangehê de jî kurator, dîroknas, hunermend û aktîvîst balê dibin ser wêrankeriya Peymana Lozanê û hewl didin ku rê li ber ji nû ve belgekirina pêvajoyê û vejandina bîra civakî vekin. Rastiya belgeyên heyî ji ber “hesasiyeta” netewedewletên çêkirî yên herêmê û qirkirinên siyasî, çandî û nijadî yên ji ber kaosa peymanê li çar parçeyên Kurdistanê pêk hatin û pêk tên, qet nehatine nîqaşkirin jî di vê pêşangehê de tên dîtin û rastiya Kurdistan û derûdora wê jî tê dîtin.

**Îşaret bi gotinên Qazî Mihemed dike**

Pêşangeh, wê bi sernavê, “Em behsa tiştan dikin” li salona pêşangehan a bi navê Forum d’hôtel de Ville ku li Place de la Palud, 1003 ye, bê danîn û heta 19’ê Gulanê li serdana xelkê vekirî be. Pêşangeha bi navê “2+2=KRDSTN” bi kuratoriya Bariş Seyitvan û Serdar Mutlu tê organîzekirin. Her wiha navê pêşangehê jî ji ber gotina Qazî Mihemed hatiye girtin û




îşaret bi gotinên wî yên li ser Kurdistanê dike.

**Bi perspektîfa Kurdistanî bûyerên piştî Lozanê**

Serdar Mutlu anî ziman ku ji ber Peymana Lozanê û encamên wê yên paşguhkirî, erdnîgariya Mezopotamyayê û Anatoliyayê ji nû ve hatiye biteşekirin û got, “Bi fêhm û feraseta ‘yek netewe, yek ziman, yek al’ ku sed sal in dewam dike, li vê erdnîgariyê gelek qetlîam, qirkirinên çandî û sirgûn çêbûne. Em weke hunermend û dîrokzanên ku tevlî pêşangehê bûne, dixwazin bi rengê huner û bi peyamên hunerî balê bibin ser Peymana Lozanê û texrîbatên wê. Weke tê zanîn, piştî vê peymanê gelek tişt li ser serê Kurdan qewimîn. Ji lewma jî em dixwazin bi perspektîfeke kurdî û Kurdistanî bûyerên piştî Lozanê û her wiha dîroka Lozanê nîşanî xelkê me yên dîasporayê bidin.

**Ji nû ve zindîkirina bîra civakî**

Encamên ekolojîk ên aktuel ên peymanê, ji aliyekî din ve zirarê didomînin. Hema bêje her roj ji aliyê dewletên derdorê ve çiyayên Zagrosan tên bombekirin, yan jî mînaka dîwarê 800 kîlometreyî ku di navbera xelkê Kurdan de hat lêkirin, xweza û zindiyên herêmê qir dike. Ev hemû di vê pêşangehê de, bi têbînîyên ji dîrokê, berhemên hunerî û bi têgînên ku hunermend xwe dispêrin wan, di vê pêşangehê de li ber çavan tên raxistin.

Serdar Mutlu got, dîroknas, hunermend û aktîvîst wê balê bibin ser texrîbatên ku Peymana Lozanê bûye sedem: “Ji bo bibelgekirina pêvajoyê ji nû ve û zindîkirina bîra civakî, ew ê hewl bidin ku bibin pêgeh.”

**Hunermendên ku tevlî pêşangeha “2+2=KRDSTN” bûne ev in;**

Osman Ahmed, Havîn Al-Sîndy, Havar Amînî, Voorîa Arîa, Khadîja Baker, Savaş Boyraz, Wîrya Bûdaghî, Tîmûr Çelîk, Salah Ebrahîmî, Serhat Ertûna, Jacopo Gallîco, Fatoş Irwen, Eren Karakûş, Serpîl Odabaşi, Walîd Sitî, Hito Steyerl, Leyla Toprak.

# Bi Sînemayê Pirsgirêkên Jinên Ereb Dijîn Vedibêje

**Derhêner û senarîst Rîma Mahmoud li dijî sansur û zextan pirsgirêkên jinên Filistînê û Ereb bi sînemayê nîşan dide.**

Derhêner û senarîst Rîma Mahmoud pirsgirêk û zextên civakî yên jinên Filistîn û Ereb dijîn, dibe ser perdeya spî. Rîma Mahmoud fîlmê xwe yê bi navê ‘Kupaya Qehweyê’ rastî û êşa diyar a jinan û zarokên Filistînê, sûcên ku li hemberî jinan tên kirin balê dikşîne ser kiryarên wan bi nav dike. Di meha Cotmeha sala 2022’an de di festîvala 8’emîn ji aliyê navenda jinan a li Filistînê ve hat lidarxistin de yek ji wan fîlmên ku di festîvalê de eleqeyek mezin dît ew bû. Fîlmên ku ji derveyî Filistînê li Misir, Urdun, Umman, Mexrib, Bahreyn, Iraq, Norveç û Çînê ketin weşanê, Rîma Mahmoud di gelek qadan de xelat girt.

**Piştî ku sansur danîn ser ji**



**weşanê hat rakirin**

Rîma Mahmoud li ruxmê zextên civakî, bi fîlmên ku çêkirine balê dikşîne ser jiyana jinan. Fîlma yekem a ku çêkiriye ji ber mijara ‘ensest’ girtibû dest saziya sansurê destpêkê xwest hinek cihên wê qut bike bi wê jî nesekinî fîlm bi tevahî ji weşanê rakir.

**Fîlma ku cara duyemîn kişand careke din hat sansurkirin**

Rîma Mahmoud da zanîn ku piştî fîlm ji weşanê hat rakirin bi rojan ranezaye û wiha got: “Ji her sehneyekê ew xeyalên ku min kiribûn, planên ku difikirîm, fîlmê ku bi mehan min ked da bi carekê ji weşanê hat rakirin û piştre şewitandina wê ji bo min gelek zor bû. Vê carê min her sehne û rû bi baldarî careke din kişand lê belê careke din hat sansurkirin, vê rewşê moralê min şikand.”

**‘Li dijî sansurê min riya têkoşînê hilbijart’**

Rîma Mahmoud destnîşan kir ku demek weke rêvebera bernameyên medyaya dîjîtal xebitiye û di wî karî de xwe nedîtiye, biryar daye ku li dijî sensurê têbikoşe û wiha domand: “Wê demê min fîlmek ji bo zara keçtiyê, cinayetên namûsê kir mijar û kişand. Gelek jinên mazlûm ji ber vê sedemê çawa hatine qetilkirin min xwest nîşan bidim. Min navê fîlm jî kir ‘Xala sor.’ Min gelek rexne girt, ji ber van rexneyan min gav şûnde ne avêt, berovajî ez teşwîq kirim. Min dest avêt rolên dayik û bavan, ‘Bermayên ji ruhekî’ û careke din fîlmê kurt ê ku min ji nexweşên penceşêrê re kişand ’20 Roj’ ket weşanê û eleqeyek baş dît.”

**Dê du kurtefîlmên nû bikevin weşanê**

Rîma Mahmoud da zanîn ku ‘Rihên derbasker’, ‘Kubeka qehweyê’ û ’18 xal’ fîlmên kurt ên ku kişandine ye li Filistînê balê dikşînin ser şer û jiyana civakê û wiha got: “Fîlmê ‘çîroka xeyal’ qetilkirina jinan nîşan dide, kurtefîlmê bi navê ‘Qehremanên ku vegera wan tune ye’ tiştên ku rojnamegerên jiyanê girtiye dest wê di mehên li pêş de bikeve weşanê.

**‘Zextên hemberî jinan tên veşartin’**

Rîma Mahmoud bi bîr xist ku li Xezayê têkoşînek mezin heye û got: “Filistîn weke keleha têkoşînê tê dîtin. Tiştên ku jinan jiyane divê binirxînim. Ji ber dorpêça li ser Xezayê fîlmên min ji bo çûyîna gelek welatan hatin astengkirin. Ez xeyal dikim ku bibim derhênerek bi nav û deng hemû cîhan min nas bike û beşdarî festîvalên fîlman ên navneteweyî bibim. Careke din di nava planên min de fîlmek ku mijara wê jin û şer e heye. Ez dixwazim vê jî bibêjim di serî de bavê min hemû malbata min piştgiriya min dikin. Ev jî ji bo min gelek girîng e.”**JINHA**

# Şêxmûs Ehmed: Astengiya herî mezin dorpêç û êrîşên dagirkeriyê ne

Hevserokê Nivîsgeha Kar û Barên Koçberan a Rêveberiya Xweser Şêxmûs Ehmed diyar kir ku rewşa kampên herêma Cizîrê û Şehbayê xerabin û got, astengiya herî mezin li pêş me, dorpêç û êrîşên dagirkeriyê ne.

**Norşîn Sîno \Qamişlo**

Li Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi qasî milyonek û nîvê penaber û koçber hene. Li herêmê paneber herî pir li Kantona Hesekê ne û hemû hewcehiyên wan ji hêla Komîteya Karê Civakî ya Rêveberiya Xweser ve tê bicihanîn. Ji ber êrîşên dagirker ên Tirk ên sala 2018'an ên li ser Efrînê ji 400 hezarî zêdetir Efrînî mecbûr man ku şûnwarê xwe berdin û li herêmên derdorên belav bûn. Dewleta Tirk a dagirker 9'ê Cotmeha 2019'an de careke din ji êrîşî herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê kir û di encamê de b herêmên Serêkaniyê û Girê Spî hatin dagirkirin, zêdeyî 500 hezar sivîlî malên xwe berdan û koç kirin. Piraniya koçberan li 80 dibistanên Herêma Hesekê bi cih bûn. Rêveberiya Xweser di nav demeke kurt de 3 kamp ava kir û koçber li van deran bi cih kirin. Li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê li gel kampên biçûk 15 kampên mezin ên penaberan hene, li van kamapan bi qasî 1 milyonî penaber hene.

Derbarê rewşa kampên koçberan yên li bakur û rojhilatê Sûriyê, hevserokê Nivîsgeha Kar û Barên Koçberan a Rêveberiya Xweser a bakur û rojhilatê Sûriyê Şêxmûs Ehmed ji me re axivî .

**'Hijmara koçberan pir mezin e '**

Şêxmûs Ehmed diyar kir ku hejmara koçrberên di kempên koçberan yên bakur û rojhilatê Sûriyê de pir zêde ne û wiha domand: "Kampên penaberan bêhtirî xwe li herêma



Cizîrê ne. Di 3'ê kampên ku koçberê Serêkaniyê û Girê Sipî di wan de bi cih dib, hijmara koçberan pir zêde ye. Herwiha hejmarek baş hîn jî di navendê pêşwazîkirinê de ne."

**'Kampên herêmên Cizîr û Şehbayê rewşên wan xerabin'**

Şêxmûs Ehmed dazanîn ku ji ber xwevekişandina hin rêxistinên mirovî rewşa hin kampên herêma Cizêrê zehmet e, li Şehba jî ji ber dorpêça hikumeta Şamê rewşa kampan pir xerab bûye û got: "Bi giştî Kampên herêmên Şehba û Cizîre rewşa wan xirabe. Ji ber êrîşên dewleta Tirk a dagirker gelek rêxistinên mirovî xwe ji her du herêman vekişamdin. Herwiha piştî şerê di navbera Rûsiya û Ukraniyayê de jî, Netewên Yekbûyî eşkere kir ku wê alîkariyên li ser vir bi awayekî giştî kêm bibe , di heman demê de jî 5 kamp tenê fermî ne ji aliyê Netewên yekbûyî ve. Ji hemû kampên li bakur û rojhilatê Sûriyê Netewên yekbûyî alîkariya 5 kampan tenê dike. Ji ber ku ew tenê ji aliyê wan bi fermî tên naskirin."

**`Astengiyên herî mezin dorpêç û êrîşên dagirkeriyê ne'**

Şêxmûs destnîşankir ku ji bo başkirina rewşa kampan gelek astengî hene, lê ya herî zêde girtina dergehên sînorî ye û wiha got: "Astengiyên me gelekin yek jê elektirîk e , ew jî ji ber ku dewleta tirk şerê avê li dijî me dike û li ser çem ê Firatê qut dike û ev yek dibe sedema nebûna elektrîkê , wek ku em dizanin jî jenetor li kampan tune ne . Ya duyem av e , xelkê me pêwîstî ava paqij a ji bo xwarin him jî vexwarinê heye, lê ji ber qutkirina stasiyona Elok ji aliyên çeteyên ser bi dewleta Tirk ya dagirker ve , xelk neçar dibin ku ava bîrên qirêj bi karbînin . Pirsgirêka herî cidî jî girtina dergehên sînorî ne . Tenduristî jî roleke sereke di kampan de dileyize , ew jî hin kêmasî tê de hene û divê Rêxistina Tenduristiya Cîhanî di vî milî de alîkariyê bike ji ber ku ew jêdera me ye , herwiha ji bo werz havînê jî pêwîstiya xelkê



me bi perwaneyan heye. Herî dawî û giring jî êrîşên rojane yên dewleta Tirk ya dagirker ên ku nahêlin aramî li herêman çêbibe û em pêşketinan bidestbixin ."

**'Ji bo çareseriya pirsgirêkên kampan hewildanên me didomin'**

Hevserokê Nivîsgeha Kar û Barên Koçberan a Rêveberiya Xweser Şêxmûs Ehmed diyar kir ku ew ê hewil bidin ku pirsgirêkên kampan çareser bikin û axaftina xwe wiha qedand: "Ji bo çarekirina pirsgirêkên kampan em ê hewil bidin bi aliyên aleqedar re bernameyekî saz bikin. Bi taybet werzê havînê li pêş me ye û pirsgirêkên avê û germê di vî werzî de zêdetir dibin."

# "Li hemberî qirkirina xwezayê em têkoşînê dikin"

**Birûc Resûl/Qamîşlo**

**Karkerên Jin yên meştilgiha Şehîd Barîn a Giştî ya li bajarê Qamişlo, diyar kirin ku ew bi karê xwe yê di meştelgehê de hewl didin ku li dijî qirkirina xwezayê bisekinin û xwezaya herêmê ji nû ve zindî bikin.**

Li gorî pisporên jîngehê, bikaranîna zêde ya ava binerd, zêdebûna hejmara erebeyan, zêdebûna rêjeya karbondîoksîdê hewa qirêj kir, qada şînkahiyê qels kir û rê li pêşiya çolbûnê vekir. Li gelek deverên herêma Cizîrê qadên şînkahî kêm in û pirsgirêkên jîngehê hene. Li gorî şopdarên rewşa jîngehê ya herêmê, siyasetên ku dewleta Tirk a dagirker dimeşîne bi qutkitina avê re şînkahî li beravên çeman kêm bû. Li aliyekî din jî, ji bo parastina jîngehî û firehkirina qadên kesk li bakur û rojhilatê Sûriyê gelek piroje û mkar hatin kirin. Yek ji van pirojeyên jîngehî çêkirina meştelgehan bû. Li tevahiya bajarên bakur û rojhilatê Sûriyê bi 10'an meştelgeh hat vekirin.

Derbarê girîngiya ştelgehan ji bo parastina jîngehê, karkerên ştelgeha Şehîd Bararn a bajarê



Qamişlo ji me re axivîn.

**'Jin û xweza ji hev nayên qutkirin'**



Jina bi navê Emîna Hiso ku di ştelgehê de kar dike, diyar kir ku xweza û jin ji hev nayên qutkirin û wiha got: "Ev 4 sal ez di şitlgiha Şehîd barîn de kardikin. Wekî tê zanîn ku di dispêkê de jin bi xweza ve pir girêdaye, ji ber ku em di wê baweriyê de ne, ku buhar bi rengên jinan dixemile, bi taybet di meha Adarê de û ev yek tekez dike ku jin û xweza ji hev nayên qutkirin. Ez jî bi karê xwe yê di şitigehê de girêdana xwe ya bi xwezayê re nîşan didim. her wiha ez ji bo isbatkirina kesayeta xwe kar dikim."

**'Her cûreyên gul daran di meştelgehê de hene'**

Emîna wiha berdewamî da axavtina xwe û got:"Di şitigehê de 12 hezar û 600 cureyên daran hene, ji wan yên hêjîr, gul, hinar û yasemînên hene. Herwiha di nava meştilgihê de hejmarek darên ku temenê wan ji sal û nîvekê zêdetir bûne hene, hejmarek dar jî, ji herêmên cuda weke Minbic, Efrîn û Hemayê em tînin, di heman demê de her cureyên daran, gulan û sebzeyan li cem me hene."

**'Êrîşên dagirkeriyê bandoreke xerab li ser xwezayê kir'**

Hiso da zanîn ku di van sale dawî de êrîşên ku li ser herêmê çêbûn, bandoreke mezin li ser xwezayê çêkir û got: "Em wekî jin bi girêdana xweza tên naskirin, her wiha armanca vê miştilgihê, ewe ku em bikaribin giştî herêman ji nû ve şîn bikin. Ji ber ku şerê li ser Rojava yê kurdistanê hat kirin, bandoriyek pir mozin li ser îkolojiya herêman kir û qadên keskahiyê kêm kir. Em bikarê xwe di meştelgehê de hewil didin bibin bersiv ji qirkirina xwezayê re û xwezayê ji nû ve şîn bikin."

**`Di salên dawiyê de ekolojiya herêmê zerarên mezin dît'**

Jina bi navê Coza Yusif ku di meştelgehê dec kar dike da xu-



yakirin ku ew ê bi çandina gul û daran, jîngehê ji nû ve vejîn bikin û got: "Ev 12`e salin ku em di rewşekî şer de derbas dibin. Di van salan de ekolojiya herêmê zerarênmezin dît û bandoreke mezin li ser xwezayê hat kirin. Ji ber kêmbûna avê tu kes nema êdî bi çandina daran re mujûl dibû . Em wekî jin hewl didin ku herêmên xwe bi çandina gul û daran û her cureyên candiniyê nû bikin."

**'Divê em xwezayê ji nû ve zindî bikin'**

Coza Yûsif wiha axaftina xwe bi dawî kir: "Divê em jin û tevahiya civakê hewil bidin ku jîngehê biparêzên û çanda çandina daran belav bikin. Herwiha divê em li hemberî ew kesên ku ekolojiyê qir dikin, biskinin û xwezayê zindî bikin."



# Bîlançoya şer a meha Nîsanê

HPG'ê da zanîn ku artêşa Tirk a dagirker di Nîsanê de hezar û 81 caran bombe li Herêmên Parastinê yên Medyayê barandin û 8 caran bi çekên kîmyewî êriş bir ser çeperên berxwedanê yên gerîla.

Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê bîlançoya şer a meha Nîsanê eşkere kir. Di bîlançoyê de ev agahî hatin parvekirin:

"Gerîlayên Azadiyê yên Kurdistanê ku hêza bingehîn a parastinê û îradeya azadiyê ya gelê me yê bindest e, li gel şert û mercên herî giran jî xaka Kurdistanê ya pîroz bi rengekî fedaî ji hêzên mêtinger parastin, diparêzin. Rejîma AKP-MHP'ê ya faşîst ku dijminê sondxwarî yê gelê Kurd e, derfetên li ber destê xwe hemû bi kar tîne û êriş dike. Rejîma şerê taybet a faşîst ku ji aliyê siyasî û aborî ve têk çûye, li ser bingeha tunekirina îradeya azad a gelê Kurd, şerê xwe yê qirêj dewam dike û bi vî rengî hewl dide li ser piyan bimîne. Li gel van êrişan, gerîlayên me yên bi fedaîtî şer dikin bi kûrkirina xeta berxwedanê rê nedan mêtingeran û bi berxwedaneke dîrokî nivîsandin."

"Rejîma AKP-MHP'ê ya faşîst ku hebûna xwe li ser tunekirina gelê Kurd ava kiriye û dixwaze bi rêbazên şerê qirêj encamê werbigire, bi nêzîkbûna hilbijartinê re êriş zêde kiriye, bi nûçeyên derewîn û çîrokên sexte yên serketinê dixwaze raya giştî bixapîne û ji siyaseta şer encamê werbigire. Rejîma AKP-MHP'ê ya sûcdarê şer ji Mêrdînê heta Botanê, ji Botanê heta Serhedê li Bakurê Kurdistanê bi hezaran dagirkerî û teknîkeke bêdawî bi dehan caran êrişên ji bo tunekirinê kir. Li gel vê yekê li hemberî Gerîlayên Azadiyê yên Kurdistanê yên bi îradeya fedaî xwe xemilandine, nekarî encama dixwaze bi dest bixe

**Herêmên parastinê yên medyayê hezar û 81 caran hatin bombekirin**



Çeperên berxwedanê yên li Herêmên Parastinê yên Medyayê, bi qasî ku hêzên me tespît kirin 76 caran bi balafirên şer, 61 caran bi helîkopterên êrişê, 944 caran bi tank, top, obus û çekên giran bi giştî 1081 caran hatin bombekirin. Artêşa Tirk a mêtinger sûcên xwe yên şer zêde kir, li ser çeperên berxwedanê yên gerîla 8 caran çekên kîmyewî û bombeyên qedexekirî bi kar anî. Rejîma faşîst bi rengekî çavsorane her cûre sûcê şer û li dijî mirovahiyê dike û ji vê yekê hêviyê dike. Ev yek jî hewldanên dawî yên rejîma li ber hilweşînê ye. Hêzên me li cihên ku dagirkeran êriş kirin û şer qewimî, bersiv dan dijmin û şer qewimî. Di vî şerî de 2 dagirker mirin, sîstemeke kamera ya mobesse hate îmhakirin û çekek topê ya 57'an hate îmhakirin.

Gerîlayên Azadiyê yên Kurdistanê ku wek Gerîlayên Modernîteya Demokratîk xwe jinûve ava kirine û bûne hêviya azadiyê ya jin, ciwan û hemû bindestan, bi keda pîroz a hevrêyên me yên nemir ên heta nefesa xwe ya dawî bi fedaîtî tê koşiyan, hêviya ji bo paşeroja azad xurt dikin. Ji fedaiyên me yên ku meha Nîsanê li Bakurê Kurdistanê nemir bûn, hevrêyên me Xebatkar Bagok, Bager Wan, Hêjar Zozan, Rosîda Bawer, Ekîn Rizgar Malazgîrt û hevrêyê me Botan Goyî yê li Herêmên Parastinê yên Medyayê tev li karwanê nemiran bûn, bi tîpên zêrîn navê xwe li dîroka berxwedanê ya bi rûmet a gelê me nivîsandin. Gerîlayên Azadiyê yên Kurdsitanê ku têkoşîna Dilxwaz Gabar û Gulçiya Gabar ji xwe re kirine mîrate û berê xwe dane serketinê, li ser şopa şehîdan û xeta Apoyî bi rengekî bêteredût wê tê bikoşin û doza azadiyê bi serkeftinê tacîdar bikin."

# 'Partiya Çepên Kesk wê di meseleya Kurd de pêvajoyeke nû bide destpêkirin'

**Serokê Rûmetê yê HDP'ê û Endamê Rûmetê yê Meclîsa Parlamenteran a Konseya Ewropayê Ertûgrûl Kurkçu got, têkbirina AKP'ê wê ji bo meseleya Kurd pêvajoyeke nû ya çareseriyê bide destpêkirin û ji bo Partiya Çepên Kesk bang kir.**

Serokê Rûmetê yê HDP'ê û Endamê Rûmetê yê Meclîsa Parlamenteran a Konseya Ewropayê Ertûgrûl Kurkçu li ser hilbijartinên 14'ê Gulanê got.

Kurkçu diyar kir ku hilbijartinên 14'ê Gulanê di asta stratejîk de girîng in û got, "Ji ber ku ya em ê hewldana avakirina dîktatoriyeke faşîst asteng bikin yan jî em ê ber bi vê hewldanê ve biçin. Divê em rê nedint têkçûnê. Di vê têkoşînê de divê em bi ser bikevin ji ber ku piştî salên 2015-2016'an yanî



piştî serketina mezin a HDP'ê, me hewldana çokşikandinê ya li ser gelê Kurd, demokrasiya Tirkiyeyê û demokratên Tirkiyeyê dihate ferzkirin, rawestand. Niha jî bi vê hilbijartinê re firsendeke girîng bi destê me neketiye ku Tayyîp Erdogan û hevkarên wî MHP, Ergenekon û vê tifaqa wan ji desthilatdariyê dûr bixînin."

**'Di çareseriya meseleya kurd de wê pêvajoyeke nû bide destpêkirin'**

Kurkçu anî ziman ku têkbirina AKP'ê wê bibe sedema çareseriya meselya Kurd û got, "Hevsengiya heyî li dijî desthilatdariyê ye, ber bi aliyê muxalefetê ve ye. Em li ber hilbijartinê ne. Dixwazim diyar bikim ku piştî vê hilbijartinê wê ji aliyê civakî û aborî ve li Tirkiyeyê guhertineke yekser nebe. Lê belê rewabûna rejîma yek şexsî wê ji holê rabe. Ev yek wê firsendê bide gelê Kurd, demokratan, xizanên Tirkiyeyê, kedkaran, her beşên civakê yên ji bo maf têdikoşin ku gotinên xwe bi rengekî azad, rêxistinbûyî û piştevaniyeke mezin bÎnin ziman. Lê belê sînorên rejîmê hene. Tişta herî girîng a ku em ji vê hilbijartinê hêvî dikin ew e ku pêşî li serdemeke nû ya têkoşînê vekin. Di mijara çareseriya meseleya Kurd de em dixwazin muxatabên nû bibînin, pêvajoyeke nû bidin destpêkirin û bi qanûnên li parlamentê amade bikin, bi hewldanên destûra bingehîn a nû derfetên wê yekê bibînin ku gotinê hîn bi xurtî bibêjin û parve bikin. Em ji bo şert û mercên têkoşînê yên nû û hîn guncaw têdikoşin. Rizgarî bi vê encamê ve girêdayî ye. Berpirsyariya me ye ku em di vê pêvajoyê de bi ser bikevin."

Kurkçu diyar kir ku AKPê wê bixwaze vê pêvajoya hilbijartinê xera bike, lê belê her hewldaneke xwe ya di vê çarçoveyê de wê li pêşberî îradeya gel têk biçe.

**'Faşîzm wê bê hilweşandin'**


Di dewama axaftina xwe de Kurkçu işaret bi girîngiya dengdana li Ewropayê jî kir û got, "Her dengekî ku li Ewropayê ji Partiya Çepên Kesk re bê dayin wê bike ku faşîzm hilweşe û deriyên Tirkiyeyê bêne vekirin." Kurkçu diyar kir ku rêjeya kêm a tevlîbûna li dengdanê jî wê bi kêrî desthilatdariyê bê û got, "HDP'ê bi saya dengên ji Ewropayê 2 wekîl zêdetir wergirt. Li Ewropayê nêzî 3 milyon hilbijêr hene. Piraniya van dengan ne yên partiya desthilatdariyê ne. Lê belê xemsariya 'bi dengekî tiştek nabe' ya li nava muxalefetê bi kêrî dîktatoriyê tê. Divê em vê yekê berovajî bikin. Bi dengekî bi tenê jî em ê karibin rêya hilweşandina faşîzmê destnîşan bikin."

# Komeleya Mafê Mirovan: Werzîşvanek jin li Îranê hate qetilkirin

**Komeleya Mafê Mirovan a Kurdistanê bi daxuyaniyekê ragihand ku çalakvana mafê mirovan, werzîşvan û çiyager Mehsa Zarin Cheng li Îranê hatiye qetilkirin.**

Komeleya Mafê Mirovan a Kurdistanê ragihand ku çalakvana mafê mirovan, werzîşvan û çiyager Mehsa Zarin Cheng hatiye qetilkirin û cenazeyê wê li qontarê çiyayek yê Tahranê hatiye dîtin.

Hêjayî gotinê ye çalakvan Mehsa Zarin Cheng dema ku piştgirî dayî serhildanên gel li Îran û Rojhilatê Kurdistanê û gelek caran di dema serhildanê de hatiye binçavkirin û êşkence lê hatiye kirin. Roja ku wê bi hevalên xwe re biçûya çiyageriyê winda bû. Di heman rojê de rayedarên hikumeta Îranê li ser mala werzîşvan de girtin, dest danîn li ser tiştên wê ên





şexsî, malbatê jî daxuyaniyek fermî neda. Di 1'ê Gulanê de cenazeyê werzîşvanê li qontara çiyayek yê Tahranê hat dîtin.

Komeleya Mafê Mirovan a Kurdistanê der barê mijarê de daxuyanî da û ragihand ku werzîşvan hatiye qetilkirin û gef li malbatê hatiye kirin. Ji malbatê xwestin sedemê mirina wê weke 'Dema ku hildida çiya ji bilandahiyê ketiye' diyarbikin û sedemê mirina wê nehat eşkere kirin.

Cenazeyê Mehsa Zarin Cheng di bin dorpêça hêzên hikumetê de li goristana Îlam Beheşt Reza hate definkirin.

# “Bi bilindkirina asta têkoşînê wê tecrîda girankirî têk biçe”

Nivîskar û siyastmedarên herêma Cizîrê diyar kirin ku tecrîda girankirî ya li ser Rêber Apo û gotin:”Ji bo têkbirîna tecrîda girankirî ya li ser Rêber Apo divê asta têkoşîna gelê Kurd bilintir bibe”

**Hemze Sêvo/ Qamişlo**

Di sala 1999’an de, di encama Komployeke Navneteweyî de ku gelek hêzên navneteweyî tê de cih girtin, Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan hat revandin û radestî dewleta Tirk a faşîst hat kirin. Ji destpêka dîlgirtina Rêber Apo û heta niha tecrîdeke giran li ser tê feriz kirin. Ji beriya 23 mehan ve û heta niha tu agahî ji Rêber Apo nehatin e girtin.

Derbarê tecrîda girankirî ya li ser Rêber Abdullah Ocalan , nivîskar Ebûd Mexso û endamê Kordînasiyona TEV-DEM’ê Yûsif Kûtê ji me re axivîn.



**‘Armanc ji tecrîdê, qutkirina Rêberê mirovahiyê ji rewşa cîhanê ye’**

Ebûd Mexso diyar kir ku armanca dewleta Tirk a dagirker ji tecrîda girankirî ya li ser Rêber Apo pêşîgirtina li fikrê azad e û wiha got: “Ji bo danîna keleman pêşberî pirojeya çareseriya pirsgirên Rojhlata Navîn, hêzên navnetewî komploya Navnetewî li dijî Rêber Apo pêk anîn. Van hêzan xwestin di şexsê Rêber Apo de, gelên azadîxwaz qir bikin. Niha rewşa gelên Rojhilata Navîn û cîhanê bigiştî di tevlîheviyeke mezin de ye, çareserî jî tenê di fikrê Rêber Apo de ye. Lê ji ber ku çareseriya pirsgirêkên Rojhilata Navîn nakeve xizmeta hêzên navnetewî de, ev hêz tecrîdê li ser Rêber Apo girantir dikin. Herwiha dixwazin Rêber Apo ji gelê Kurd û tevahiya gelên azadîxwaz qut bikin.”

**‘Tecrîda ser Rêber Apo bi erêkirina hêzên navnetewî ye’**

Nivîskar Ebûd Mexso da xuyakirin ku dewleta Tirk a dagirker ji aliyên hêzên navnetewî ve tê birêvebirin û axafdtina xwe wiha qedand: “Dewleta Tirk ji aliyê hêzên navnetewî ve tê birêvebirin. Herwiha tecrîda ku li ser Rêber Apo tê feriz kirin bi êrêkirina van hêza ye. Bêdengiya



rêxistinên mafên mirovan û SPT’yê jî vê yekê nîşan dide. Ji ber wê dewleta Tirk a dagirker û tevahiya rêxistin, sazî û hêzên navnetewî berpirsyarê tecrîda li ser Rêber Apo ne.”

**‘Bi fikr û felsefeya Rêber Apo têkoşîna azadiya gelan geş bû’**

Di heman çarçoveyê de endamê Kordînasyona Tevgera Civaka Demokratîk (TEVDEM) Yûsiv Kûtî da xuyakirin ku fikrê Rêber Apo çareseriya tevahiya pirsgirêkên Rojhilata Navîn e û wiha domand: “Bi saya fikrê Rêber Apo bingeha azadiya jin , civak, wekhevî , demopkrasiyê û parastina ekolojiyê hat dayîn. Felsefeya Rêber Apo ji gelê kurd û tevahiya gelên azadîxwaz re bû çiraya azadiyê. Bi saya fikrê azad yê Rêber Apo gelê kurd li herçar perçeyên Kurdistanê têkoşîn kirn, ji bo bidestxistina mafê xwe şoreş li dar xistin, mînaka herî nêz jî Şoreşa Rojava ye ku bi pêşengiya jinê û gelên bakur û rojhilatê Sûriyê bû. Pirojeya Netewa Demokratîk bandor li tevaya gelên Rojhilta Navîn kir.”



**‘Berxwedana gelan wê tecrîdê têkbibe’**

Endamê Kordînasiyona Tevgera Civaka Demokratîk (TEV-DEM) Yûsiv Kûtê bang li tevahiya gelên azadîxwaz kir ku li hemberî tecrîdê têkoşînê bilindtir bikin û axaftina xwe wiha qedand: “Bi fikrê û felsefeya Rêber Apo wê tevahiya gelên azadîxwaz azad bibin , herwiha tevahiya pirsgirêkên Rojhilata Navîn û cîhanê çareser bibin. Ji bo rakirina tecrîdê û azadiya fîzîkî ya Rêber Apo, divê gelê kurd û gelên azdîxwaz têkoşînê bilintir bikin. Ji her kesî re eşkere bûye ku çareseriya hemû pirsgirêkên civakî û siyasî yên Rojhilata Navîn, wê bi azadiya Fîzkî ya Rêber Apo pêk bên.”

# “Wê berxwedana gelê herêma Şehbayê dorpêçê bişkîn e”

Norşîn Sîno\ Qamişlo

**Seroka Desteya Jinê ya Kantona Cizîrê Evîn Paşp diyar kir ku Hikûmeta Şamê bi siyaseta dorpêçê ya ku li ser gelê Şehbayê dide meşandin dixwaze vîna gel têk bibe û got, zihniyeta Hikûmeta Şamê nehatiye guhertin, hevgirtin û berxwedana gelê Şehbayê wê dorpêç têk bibe.**

Ji 18 Adara 2018’an de dema ku dewleta Tirk ya dagirker û çeteyên wê herêma Efrîn dagir kirin, Şêneyên herêmê neçar man ku berê xwe bidin herêma Şehbayê û li wir bi cih bibin. Lê Hikûmeta Şamê ji wê demê ve û heta niha li ser koçberên Efrînê yên ku li Şehbayê bi cih bûn e dorpêçêke giran ferz dike. Hikûmeta Şamê derfet nade ku sûtemenî , ard, derman û pêdiviyên jiyanê yên ku ji aliyê Rêveberiya Xweser ve ji bo gelê Herêma Şehba tê Şandin , derbasî herêmê bibe. Herî dawiyê ji ber nebûna sûtemeniyê di 27’ê Nîsanê de elektirîk bi tremamî li ser herêma Şehbayê hat qutkirin û kar û xebatên saziyan bigiştî hatin rawestandin.

Derbarê dorpêça girankirî ya ku ji aliyê hikûmeta Şamê ve li ser Herêma Şehbayê tê feriz kirin, Seroka Desteya Jinê ya herêma Cizîrê Evîn Paşo ji me re axivî.

**`Bi rêya dorpêçê dixwaze vîna gel têk bibe’**

Seroka Desteya Jinê ya kantona Cizîrê Evîn Paşo da zanîn ku hikûmeta Şamê bi rêya dorpêçê dixwaze siyaseta xwe ya şikandin vîna gelê hermê bidomîne û



wiha axivî: “Hikûmeta Şamê bi siyaseta xwe ya dûrxistin, şîdet û pûçkirinê navdare . Bi vê dorpêça girankirî ya li ser herêma Şehbayê dixwaze gelê herêmê dûrî daxwaz û hêviyên wan yên wekhevî û demokrasiyê dûr bixe. Hikumet her dem li hemberî gel rêbazên tunekirinê bikar tîne.”

**`Armanca sereke ji dorpêçê têkbirina Rêveberiya Xweser e`**

Evîn dazanîn ku armanca hikûmeta Şamê ye sereke ji dorpêça li ser Şehbayê têkbirina Rêveberiya Xwesere û wiha domand: “Ji ber ku Rêveberiya Xweser a Demokratîk xeta sêyemîn hilbijart, rêveberiyê xwe nesipart hikumeta şamê û ni jî çeteyên bi navê muxalefetê. Rêveberiya Xweser ji bo berjewendiyên gelên Sûriyê kar kir, ji ber wê tevahiya hêzên dagirker êrêşî Rêveberiya Xweser kirin û xwestin wê têk bibin. Bi taybet dewleta Tirk a dagirker bi riya êrîşên rojan e xwest rêveberê têk bibe. Hikûmeta Şamê jî , xwest bi rêya dorpêçê zextê li Rêveberiya xweser bike û wê lawaz bike, herwiha di bin şert û mercên xwe de wê têk bibe.”

**`Hikûmeta Şamê bi zihniyeta xwe ya heyî naxwaze aloziya Sûriyê çareser bibe`**

Evîn Paşo tekez kir ku bi meşandina van siyasetên qirêj ,Hikûmeta Şamê tekez dike ku zihniyeta wê û ya dewleta Tirk ya faşist yekin, herwiha ew nikare bibe beşek ji çareseriya aloziya Sûriyê û wiha dirêjî da axaftina xwe: “Hikûmeta Şamê bi meşandina dorpêça girankirî ya ku bi rêya wê siyaseta xwe ya qurêj derdixe holê, tekez dike ku zihniyeta wê eynî zihniyeta dewleta tirk ya faşiste û bi şêwazên cuda qirkirina Kurdan ji xwe re dikin hedef. Heta ku ev zihniyeta hikûmeta Şamê be her



wiha siyasetên xwe neguherîne , tevî dirêjbûna kirîza Sûriyê ku 12`e sa li pey xwe hişt, ew ê bi ser nakeve û ne jî dibe beşek ji çareseriya aloziya Sûriyê.”

**` Bi hevgirtin û berxwedana gelê Şehbayê wê dorpêç têk biçe`**

Seroka Desteya Jinê ya kantina Cizîrê Evîn Paşo diyar kir ku hevgirtina û bewrxwedana gelê herêma Şehbayê wê dorpêçê têk bibe û wiha axaftina xwe bidawî kir: “Li herêma Şehbayê berxwedaniyek mezin ji aliyê gelê wê ve tê meşandin, lewma hikûmeta Şamê herwiha êrîşên dewleta tirk wê nikarîbûn îradeya vî gelî bişkînin. Li ser esasê vê berxwedaniya mezin û îradeya xurt wê gele herêma Şehba dorpêçê têk bibe.”



# “AKP-MHP’ê rojnamevanên li ser şopa heqîqetê dike armanc”

Rojnamevanên li bakur û rojhilatê Sûriyê diyar kirin ku dewleta Tirk li Bakurê Kurdistanê û Tirkiyê ji bo veşartina berxwedana gel û binpêkirinên xwe, rojnamevanên çapemeniya Azad binçav dike û gotin: “Hikumeta AKP-MHP’ê ji bo ku civakê bêdeng bike û di hilbijartina de bi ser keve, êrîşên xw yên li dijî rojnamevanan zêde dike.

**Hemze Sêvo/Qamişlo**

Li bakurê Kurdistanê êriş û zextên li dijî xebatkarên Çapemeniya Azad dewam dike. Rojnamevanên li dû heqîqetê hema bêje her roj tên binçavkirin û girtin. Bi nêzîkbûna dema hilbijartinên 14’ê Gulanê, hikumeta AKP-MHP’ê ji bo ku bi ser bikeve zext û êrişên xwe li ser siyasetmedar û rojnamevanan zêde dikin.

Di çarçoveya lêpirsîneke Serdozgeriya Komarê ya Amedê de li 21 bajaran der barê 216 kesan de biryara binçavkirinê hatibû dayîn. Ji van kesan 144 kes hatibûn binçavkirin. Ji kesên binçavkirî 48 jê hatin girtin. Di nava kesên hatin binçavkirin de rojnamevan, siyasetmedar, hunermend û parêzer hene.

Hikumeta AKP-MHP’ê ji bo ku bi ser bikeve êrîşên xwe yên ser tevahiya Kurdistanê jî zêde dike. Li her derê êrîşên xwe yên qirkirinê didomîn e û dixwaze li ser rijandina xwîna gelan bi ser bikeve.

Di derbarê hilbijartinên Tirkiyê yên 14‘ê Gulanê de, rojnamgerên Rojavayê Kurdistanê ji rojnameya me re wiha axivîn.

**‘Rojnameger ragihînerên rastiyê ne, AKP’ wan hedef digre’**

Pêşkêşvana Rojava TV, Jiyan Mîrza di destpêka axaftina xwe de diyarkir ku hikumeta AKP-MHP`ê ji bo ku kiryarên xwe yên xerab û qirêj veşêre rojnamevanên ku ji bo eşkerekirina rastiyê kar dikin



dike armanc û wiha domand: “Bi nêzbûna hilbijartinên serokkomarî û perlemantoya Turkiyê yên 14’ê Gulanê, hikûmeta AKP-MHP’ê rêbazên xwe yên sextekar û neqanûnî bikar tîn e. Dixwaze civakê bê deng bike û her kesê ku deng nedê dike armanc. Niha li Amedê tenê zêdeyî 150 kesî hatine girtin ku di nava wan de siyastmedar, hunermend, çalakvan û rojnamevan jî hene. AKP-MHP’ê ji bo ku rastiyê li ser cîhanê veşêre, di asta yekê de rojnamevanan dike armanc. Herî dawiyê di encama êrîşên li ser rojnamevanên Çapemeniya Azad bi 10’an rojnameger û nûçagihan hatin destgîrkirin, ji wan jî, edîtorê Mezobotamiyayê û edîtorê JNHA jî hatin dîlgirtin. Ev jî siyaseta qirêj ya hikumeta AKP’ê dide diyarkirin û ev jî ji bo pûçkirina zimanê rastiyê. Rojnameger raghînerên rastiyê ne, AKP’ê wan dîl digr e’”

**‘Êrîşên li ser Kurdistanê; lîstokeke qirêj ya AKP’ê ye’**

Jiyan Mîrza di dawiya axaftina xwe de, anî ziman ku li dû van êrîşên ku hikumeta AKP’ê li ser tevahiya Kurdistanê dike, pilanên qirêj hene û wiha domand:”Bi nêzîkûna hilbijartinên serokkomarî û perlemantoya Tirkiyê re êdî hikumeta AKP-MHP’ê êrîşên xwe li ser Qadên Berxwedanê, herêmên Başûr û Rojavayê Kurdistanê di van rojên dawiyê de zêdetir dike. Her wiha di van rojên bûrî de li Kobanê dagirkeriya Tirkiyê bi firokeke keşfê ya bê mirov erbeyek armanc girt û di encamê de şervanekî QSD’ê gîhişt asta şehadetê. Wekî din li Başûrê Kurdistanê jî, li ser Qadên Berxwedanê jî êrîş zêdetir bûne û ranewestiyan e. Her wiha êrîşa ku dagirkeriya Turkiyê li ser firokxaneya Silêmaniyê jî kirî yek ji pilanên



qirêj yên hikumeta AKP-MHP’ê ne. Dixwaze li her devrê tevlîheviyê derxe, ji bo ku di hilbijartinan de bi ser keve.”

**‘Bêyî binkeftina AKP’ê çareserî nepêkan e’**

Di heman çarçoveyê de nûçegehanê ANHA`yê Xalid Etê jî diyar kir ku eger hikumeta AKP -MHP`ê bi bin bikeve, wê bibe çare ji kirîzên Tirkiye, Kurdistan û Rojhilata Navîn re û wiha domand: “Hilbijartinên Serokkomarî û Perlemantoya Tirkiyê yên ku wê di 14`ê Gulanê de, werin destpêkirin;



weke pirojeyeke dîrokî ye, wê guhertinên siyasî û civakî yên bingehîn li ser asta Tirkî, Kurdistan û Rojhilata Navîn bi xwe re bîne. Rewşa aborî,civakî,siyasî ya Tirkiyê û tevaya herêma Rojhilata Navîn di kirîzên bêserûber de ye. Herwiha niha jî bi nêzîkbûna van hilbijartinan Erdogan û hikumeta wî ya faşist bi hemû rengî hewl dide ku di van hilbijartinan de bi ser bikeve. Mixabin mayîna Erdogan li ser desthilatiyê û serweriya Tirkiyê, helbet wê Rojhilata navîn bi giştî di van kirîzan de bimîne, dibe ku derbasî rewşeke xirabtir jî bibe. Her wiha çareserî ji bo van kirîzan jî heye, di dema niha de, Partiya Çepên Kesk dibe ku bibe bersiv ji pisgirêkên Bakurê Kurdistan, Tirkiyayê û Rojhilata Navîn re. Tişta ku bihêle ev yek pêk were; destekdayîna gelê Bakurê Kurdistan û Tirkiyê bi riya dengdayîna xwe ji Partiya Çepên Kesk re ye. Dewleta Tirk li Bakurê Kurdistanê û Tirkiyê ji bo veşartina binpêkirinên xwe, rojnamevanên çapemeniya Azad binçav dike. Hikumeta AKP-MHP’ê ji bo ku civakê bêdeng bike û di hilbijartina de bi ser keve, êrîşên xw yên li dijî rojnamevanan Jî zêdetir dike”

## Erdogan hîn jî çavkaniya xirabiyê ye



**Zekî BEDRAN**

Dewleta Tirk li Sûriyê xirabiyên xwe didomîne. Niha jî hewl dide di çarçoveya hevdîtinên 4’an de şerekî nû yê navxweyî bide destpêkirin. Nekarîn rêveberiya Esad tune bikin. Li gel ku qadên weke Efrîn, Serêkaniyê û Girê Spî dagir kir jî, nekarî rêveberiya xweser tune bike. Hevdîtinan bi Esad re dikin ji bo qaşo “çareseriyê” bibînin. Lê “Artêşa Netewî ya Sûriyê” ku li dijî rêveberiya Esad ava kiribû belav nake. Ji Esad re dibêjin “were em bibin hevkar, Kurdan û rêveberiya xweser ji holê rakin”.

Heta ku dewleta Tirk leşkerên xwe ji Sûriyê nekişîne, her hevdîtin û bazariya bi rejîma Sûriyê re dike dê bibe sedema mayîndebûna Tirkiyê ya li ser axa Sûriyê. Jixwe herêmên ku dagir kirine, amedekariya tevlîkirina axa xwe didomîne. Evqas dilxwaziya wan a ji hevdîtinan re ne ji bo aşîtiyek rast a li Sûriyê ye. Armanca wan ew e ku sînorên xwe bixin mîsogeriyê, gelê Kurd û rêveberiya xweser tune bike û penaberên Sûriyê paşve bişîne. Ev xwestekên xwe li ser ragihandinê jî anîn ziman. Li vir daxwaz û fikarek ji bo aşîtiya Sûriyê û gelê Sûriyê tune ye. Dixwazin şerekî nû yê navxweyî li Sûriyê bidin destpêkirin.

Ji ber ku di hevdîtin û ragihandinê de rayedarên Sûriyê vekişîna leşkeran xistin rojevê, rayedarên Tirk neçar man daxuyaniyekê bidin. Eger baldar bin, di vê mijarê de qet naxivin û daxuyaniyan nadin. Ji ber nafikirin ku dawiyê li dagirkeriyê bînin. Piştî hevdîtinên dawî, Wezîrê Karê Derve M. Çavûşoglu got “Eger em ji Sûriyê derkevin dê xwîn birije”. Dema ku dagir kirin wan bixwe bi hezaran kes qetilkirin, malên gel talan kirin. Vê weke pêvajoyek xwînrij nabînin. Lê vekişîna xwe weke karesatekê bi nav dikin û dixwazin dagirkeriyê mayînde bikin.

Eger artêşa Tirk ji axa Sûriyê derbikeve û gel vegere warê xwe, dê çima karesatek çêbibe, yan jî çima xwîn birije? Dixwazin bi vê çi bêjin? Qasî tê fêmkirin Idlib û El-Nûsra fikarên destpêkê ne. Niha ew xistine parastinê. Ji derveyî wê, dê çi ji bi hezaran çeteyên ku di bin navê Artêşa Netewî ya Sûriyê de kom kiriye bikin? Eger artêşa Tirk û parastina wî nebe ev hêz wê nikaribe van herêman di destê xwe de bigrin. Ji ber ku ne xwediyê wê axê ne û gel wan napejirîne. Neçar in bicehnimin û herin. Atêşa Tirk jî parêzvanê wan e. Derxistina van çeteyan rayedarên Tirk kûr dide fikrandin.

Gelo dê faşîzma Erdogan û Baxçelî van çeteyan bifiroşe? Bêguman dê bike. Erdogan hevalên xwe jî firotin. Niha li gel wî kesekê berê nemaye. Ji bo wan berjewendî û desthilat hertişt e. Çete zêde tiştekî îfade nakin. Lê hîn jî dixwaze wan bikar bîne. Li hemberî Kurdan û rêveberiya Şamê pêwîstiya wan pê heye. Eger wan ji destê xwe derxe dê hêza wî ya bazarê lewaz bibe. Ji derveyî vê dixwaze di hindirê sînorên Tirkiyê û herêmên gerîlla jî ji wan sûd bigre. Eger niha wan li Sûriyê di holê de bihêle, zêde derfeta bikaranîna çeteyan namîne.

Li holêye ku Erdogan tevahî çavkaniyên Tirkiyê ji bo şer bikar anî û aboriya welêt aniye ber têkçûnê. Dewletek mafyayî derket holê. Dizî, derew, talan bûye şêweyê rêveberiya wan. Pir diyare ku rêveberiyek wiha ji bo xêra gelê Sûriyê tu gavan navêje. Gel dixwaze dagirkerî bi dawî bibe. Ew jî dibêjin eger em ji Sûriyê derbikevin dê xwîn birije. Ev tê çi wateyê? Dibêjin, em dernakevin, dagirkeriyê bipejirînin, yan jî em ê xirabtir bikin.

Rêveberiya Erdogan di tengasiyê de ye. Tirkiye diçe hilbijartinan. Partiyên muxalefetê li gorî berê bibandortir bûne. Ji derveyî wê, bi tifaqên ku hatine çêkirin re dengê Kurdan encamê diyar dikin. Yanî Kurd bûne kilîta hilbijartinê. Erdogan jî kampanyaya xwe ya hilbijartinê li ser dijminahiya Kurdan û mîlîtarîzmê ava kir. Ji Rûsyayê destek girt, xwest li Sûriyê tevgerek din a dagirkeriyê bide destpêkirin û bi hewayekî serkeftinê here hilbijartinan. Ev nebe jî, dibêje em ê penaberan vegerînin Sûriyê û dixwaze bi vî awayî zexta li ser xwe kêm bike. Yanî ji derve pêngavan diavêje û dixwaze vê di polîtîkaya hindir de bikar bîne.

Demek kurt ji hilbijartinan re ma. Erdogan êrişên xwe yên li ser qadên gerîlla qet nesekinand. Lê li wir şansê wî yê di demek kurt de encamekî bidest bixe tune ye. Ev du sale vê diceribîne. Dixwest hewayek serkeftinê ava bike û here hilbijartinan û qezenç bike. Ev nebû, ji bo wê şansê xwe li Sûriyê diceribîne. Heta niha encamek ku dixwest ji wir jî negirtiye. Di van mijaran de gelek daxwaz ji Rûsya û rêveberiya Şamê kirin. Qasî tê fêmkirin heta niha tiştên dixwaze nehatiye dayîn. Lê dîsa jî pêwîste baldar bin. Tu xirabî nîne ku ev rêveberiya faşîst neke.

## Piştî Erdgan!!!



**Farûk SAKIK**

Dema ev sernivîsa min hat xwendin, dibe ku gotinek pêşiyan were bîra we: “Hê hesp tine afirê amade dike”. Na..Hesp dixuyê…

Bi vê hilbijartinê wê di 14’ê Gulanê de helbet rejîma heyî wê biçe, di her qadên demokrasiyê de wê pêvajoyeke nû dest pê bike.

Lê di vê pêvajoya nû de bendewarî çine? Bi taybetî Kurd çi dixwazin ev yek ne tenê di kampanyaya hilbijartinê de wek daxwazek, an jî temeniyek were gotin, divê ev daxwaz bi lezûbez piştî 14’ê Gulanê pêk werin.

Em çawa hatin vê rojê? Faşîzm li Kurdistan û li Tirkiyê çawa har bû? Divê baş were analîz kirin. Faşîzm di sala 2015’an de berî hilbijartinan, di 5’ê Nîsanê de bi destpêkirina tecrîda girankirî ya li ser Rêber Apo derbasî qonaxeke nû bû. Di rastiya xwe de şer ne ku piştî hilbijartinên 7’ê Hezîranê dest pê kir. Divê di tarîxa destpêka faşîzmê û şer de 5’ê Nîsanê esas were girtin.

Di pêvajoya hilbijartinên 7’ê Hezîranê de dîtin paradîgmaya Rêber Apo ya îtifaqa demokrasî û siyaseta Tirkiyebûnê encam digre û ber bi serkeftinê ve diçe, êriş kirin.

Îro vê yekî dîsa dibînin û ji bo vê yekê li dijî tifaqa ked û azadiyê êrişên derhiqûqî danê destpêkirin. Lê bi ti awayî nikarin encam bigirin. Ev paradîgmaya Rêber Apo wê dawî li vê deshilatdariyê bîne.

Lê em derbasî 15’ê Gulanê bibin. Ango rojek piştî hilbijartinê. Roja piştî têkçûna Erdogan. Heger hostayê vê serkeftinê Rêber Apo be, divê ku em jî ji wê derê destpêbikin. Divê ku ji destpêkê de ji şert û mercên tecrîda girankirî ya li ser Rêber Apo û azadiya wî ya fizîkî werin çareserkirin.

Eger Rêber Apo azad nebe, heger fikr û ramanên wî, nexşeriya çareseriya wî, paradîgmaya wî, di demokrasiya Tirkiyê de neyê bi cîh kirin, wê emrê vê serkeftinê pir kurt be. Tifaqa riya sêyemîn ango Tifaqa Ked û Azadiyê vê yekê baş dizane. Dîsa tişta herî girîng a ku divê em bizanin ew e ku ev tifaq tenê bi hilbijartinan re sînordar nemîne. Li meclisê jî li gor esasên tifaqê tevbigerin.

Her çiqas li meclisê bihêzbin jî, lê ji bo ku ne desthilatdarin wê astengî derkevin pêşiya wan. Divê ev hêz di nav xwe de birêxistin bibin da ku civakê fêrî komara demokratîk bikin. Fêrî demokrasiya ku bisalane ji vê erdîngariya dûrketiye bibîrbixin. Rewşenbîr, demokrat, çep-sosyalîst, kedkarên Tirkiyê jî di vî warî de xwedî berpirsyariyê ne.

Divê bi wan were famkirin ku demokratîkbûna Tirkiyê ji nêz ve çareseriya doza Kurdistanê ve girêdayî ye. Pirsgirêka Kurd pirsgirêka demokratîkbûna herî bingehîn ya Tirkiyê ye.

Hin nîqaş ji anha de destpêkirine û dibêjin; “Gelo pêvajoyeke nû ya muzakereyan wê dest pê bike, yan na?” Ev pêvajo wek min li jor destnîşan kirî bi statuya Îmraliyê ve girêdayî ye. Êdî dewlet jî nikare ji bo pêvajoyeke nû biryar bide. Biryar divê Rêber Apo bide.

Tişta herî girîng jî ewlehiya şoreşa Rojava ye. Li Rojavayê Kurdistanê jî hêviyên gel di hilbijartinên 14’ê Gulanê de hene. Di sohbetên gelên herêmê de vegera deverên hatine dagirkirin tê kirin. Ji bo vê yekê çawa ku piştî Erdogan yekem mîsyon azadiya Rêber Apo ye, wisa xwedî derketina Şoreşa Rojava jî esas e. Ji bo ew destkeftiyên kurdan ê têkoşîna 50 salan e.